Sêzdemîn Rêziknameya-Koronayê ji bo Bremen û Bremerhavenê

Freie Hansestadt Bremen

Kurtahiya bi zimanekî hêsanî [1]

ji 11.08.2020‘an heta 11.09.2020’an derbasdar e

Beşa 1.
Civîn û saziyên jiyana civakî (§ 1 heta § 8)

1. Navbera bi kesên din re

Rêbaza gişti

Heta ji dest tê, li qadên vekirî divê di navbera mirovan de bi kêmanî 1,5 mîtro navber hebe. Di menzelên girtî de (yên ji bo werzîşê, stirînê û yên bi vî rengî) divê navber herî kêm 2 mîtro be.

Îstîsna

Di rewşên jêr de navberdanîn ne pêwîst e:

- ✓ Di navbera endamên malbatê de (Malbatên patchwork, herweha dapîr û bapîr û nevî jî tê de)
- ✓ Di navbera kesên ji nav heman avahî de (wek mînak komên hevjiyanî)
- ✓ Ger du malbat an jî komek ku ji 10 kesan û ji gelek navmaliyan pêk tê, bên cem hev
- ✓ Di navbera kesên werzîşê dikin de, lê tenê wek komên neguherbar û heta 30 kesan (bi lîsteya navan)
- ✓ Pêlewan û werzîşvan (ji bo wan destûr pêwîst e)
- ✓ Di lênihêrîna zarokan de, yên li baxçê zarokan û lênihêrîna rojane de
- ✓ Ger wanê an jî lênêrîn li dibistanan di komên piçûk û neguherbar de bên çêkirin.

[1] Rêziknameya temamî û pêgirêdayibûna qanûnî ev e: "Sêzdemîn Rêziknameya ji bo parastina li dijî enfeksiyonên nû yên bi koronavirusê SARS-CoV-2". Ya 05. Tebax 2020’an.

2. Hejmara Mirovan

Rêbaza giştî

Li derên vekirî û giştî de civîn, lihevkombûn, partî û yên bi vî rengî ji 10 kesan zêdetir ne destûrdar in. Civîn û lihevkombûnên bi vî awayî yên ji 1000 kesî zêdetir heta 31. Cotmeh 2020'an qedexe ne.

Îstîsna

Ligelhevhatina mirovan di rewşên jêr de derbasdar e:

- ✓ taybet û pîşeyî, partî û yên bi vî rengî (li hundir heta 250 û li derve heta 400 kesan), **lê**:
  - Bi konsepta ewlehiyê û hîjyenê
  - Lîsteya navan û agahdariyên têkiliyê
  - Navberê biparêzin
  - Hundir baweşîn bikin.
- ✓ Civînên bi serîlêdan
- ✓ Karên li gorî bendeya 12 paragrafa 1. ya Zagona Bingehîn
- ✓ Di karûbarên giştî û dadwerî de
- ✓ Li seyareyên giştî
- ✓ Li serdanên dezgehên destûra vekirinê girtine de

3. Bikaranîna maskeyan

Rêbaza giştî

Hemî kes divê di rêwitiya giştî de, li otobos û tramvayan de, dema danûstendinê de û di dezgehên bi vî rengî de mecbûr in maskeyan bikar bînin.

Îstîsna

Ev kes ne mecbûr in maske bi kar bînin:

- ✓ Zarokên ji 6 salî piçûktir
- ✓ Mirovên ker û giranbihîstî **û** herweha kesên têkîldarên wan û bi wan re diaxivin.
- ✓ Ji ber rewşa astengî, ducanî an jî sedemên tenduristî

4. Girtina sazî û dezgehan

Rêbaza gişti

Dezge û sazî dikarin deriyên xwe ji bo serdanan vebikin.

Îstîsna

Lê divê sazî û dezgehên li jêr ji bo serdanan dîsa girtî bimînin:

- X Klûb, dîskotek, cihên şahiyê û kêfxweşiyê û yên bi vî awayî
- X Avahiyên kerxaneyan/laşfiroşiyê û klûbên swingerê
- X Saûna, klûbên saunayê

5. Saziyên vekirî divê di rewşên jêr de bi baldar bin

Rêbaza gişti

Ger saziyek xwedî sazûmanên taybetî be, divê wan bicîh bîne. Di hemî rewşên din de, yên berpirsiyar divê di rewşên jêr de baldar bin:

- ✓ Kesên berpirsiyar navberdanîna pêwîst peyda dikin.
- ✓ Kesên berpirsiyar konsepta ewlehî û hîjyenê bi cîh tînin.
- ✓ Kesên berpirsiyar heke pêşkêşî di hundur de be, lîsteya navan û agahiyên têkîldariyê kom dikin.

Îstîsna

Saziyên li jêr ne mecbûr in, herweha li hundir jî lîsteya navan çêbikin.

- ✓ Cihên danûstendinê
- ✓ Sazî û dezgehên ji bo raya gişti, **lê**: cihên avjeniyê yên girtî, cihên lîstikê yên li hundir, şano, opera, malên konseran, saziyên lihevkombûnê û herweha cihên lihevcivînê divê dîsa li deverên girtî lîsteya navan bigirin.
- ✓ Sazîyên perwerdeya pîşeyî, pêşketî (yên gişti û taybet); lê divê beşdarvan navên xwe û agahiyên têkîldariyê bidin.

6. Kargerî û destkarî

Rêbaza gişti

Kargerî û destkarî dikarin bêyî navberdanîna 1,5 m. bên pêşkêşî kirin. Lê belê divê şert û mercên ku rîskê kêm bikin, bên bi cîh anîn.

7. Têgehên ji bo ewlehî û hîjyenê

Rêbaza gişti

Divê têgehên ewlehî û hîjyenê berbiçav û watedar bin. Di avakirina konseptê de kesên berpirsiyar divê di mijarên jêr de bi baldar bin:

- ✓ Konsept divê rave bike, dê navberdanîn çawa bê bicîh anîn
- ✓ Konsept rêbazên ewlehî û hîjyenî rave dike.
- ✓ Konsept divê rave bike, dê menzelên girtî çawa bên baweşîn kirin.
- ✓ Di amadekariyên civînan de divê ji bo hejmara kesan sînoreke hebe û ev sînor dê çawa bê parastin, divê bê gotin.
- ✓ Li kargehan konsept divê agahiyên derbarê ewlehiya kar jî binivisîne.
- ✓ Ger sazî daxwaza konseptê bike, divê kesên berpirsiyar wê nîşan bidin.

8. Lîsteya navan û agahiyên têkîldariyê

Rêbaza gişti

Kes û sazîyên berpirsiyar, ên ku lîsteya navan berhev dikin, divê li jêr binihêrin:

- ✓ Li ser lîstê divê agahiyên nav û navnîşan (Telefon an jî E-Mail) û dema hatin û çûndinê hebin.
- ✓ Kesên berpirsiyar van agahiyan ji bo sê hefteyan li cem xwe qeyd dikin.
- ✓ Kesên mêvan û kiriyar tenê ger agahiyên xwe bidin, dikarin bên pêşwazî kirin.
- ✓ Saziya Tenduristiyê berpirsiyar divê karibin bigihîjin van agahiyan.

Beşa 2.
Nexweşxane, malên lênêrînê, kargehên ji bo kesên bi asteng û saziyên bi vî awayî (§ 9 heta § 15)

1. Nexweşxane

Rêbaza gişti

Nexweşxane û dezgehên ji bo tedawiyên ser lingan dikarin ameliyatên xwe yên plansazîkirî û girtina nexweşan pêk bînin.

Îstîsna

- ✓ Ameliyatên ku hatine plansazî kirin, dikarin bên kirin, ger bi vî mebestê amûrên hilmgirtinê ji 48 saetan zêdetir neyên bikaranîn.
- ✓ Nexweşxane divê kapasîteyên xwe yên ji bo nexweşên koronayê biparêzin.

2. Rêbazên serdanê

Rêbaza gişti

Serdan di sazî û rewşên jêr de bi destûr in:

- ✓ Navendên lênihêrîna nexweşan li gorî § 71 paragrafa 2. a yazdemîn pirtûka zagona civakî.
- ✓ Navendên ji bo kesên bi asteng -li gorî § 2 paragrafa 1. a nehemîn pirtûka zagona civakî-yên bi alîkariyên hevgirtinê bi şev û bi roj.
- ✓ Hîn saziyên lênêrînê (li rêziknameya orjînal binihêrin)
- ✓ hemî sazîyan de pêdiviyeke taybet û mafdar pêwîst be (wek mînak di mijarên zarokên temen piçûk de, zayîna zarokan de, rewşa acîl de, di îstasyonên palyatîf de, di lênêrîna nexweşên giran û miriyan de. Herweha serdanên ji ber sedemên pîşeyî derbasdar in.)

Lê: li saziyên li jor hatine binavkirin de serdan tenê di rewşên jêr de derbasdar e. Sazî divê şert û mercan li ser rûpelên xwe yên înternetê biweşînin. Şert û merc ev in:

- ✓ Divê tu semptomên vîrûsa koronayê bi kesên tên serîlêdanê û kesên mazûban nîn bin
- ✓ Sazî serdanê li cem xwe qeyd dike û 21 rojan diparêze (Nav, dema serdanê, agahiyên kontaktê/têkiliyê).
- ✓ Sazî ji kesên mêvan re derbarê konsepta xwe ya hîjyenê de agahî dide.
- ✓ Kesên tên serdanê û mazûban navberdanîna herî kêm 1,5 m. diparêzin û maskeyan bi kar tînin. Endamên malbatekê, ger maskeyên xwe bi kar bînin û berî û piştî serdanê destên xwe dezenfekte bikin, ne mecbûr in navberê deynin.

- ✓ Xebatkar serdanê dişopînin.
- ✓ Îstîsnayên din jî dikarin bên çêkirin.
- ✓ Hîn şert û mercên wekî din li hin saziyan dikarin bên rêbaz kirin. (Wek mînak serîlêdana ji bo zîyaretê)

Li sazî û dezgehên jêrîn de serdan **bi awayekî îstîsna** bi destûr in:

- ✓ Nexweşxane û saziyên ji bo tedawiyên li ser piyan
- ✓ Avahiyên lênihêrandin û rehabîlîtasyonê ku wek nexweşxaneyan dixebitin
- ✓ Navendên diyalîze, klînîkên rojane, navendên zayîna zarokan
- ✓ Navendên dermankirin û lênihêrînê yên bi vî rengî

Ev sazî di bin şert û mercên hatine danîn de ger pêdivî hebe destûrê bidin rewşên îstîsnayî. Bi taybetî kesên temen piçûk, di rewşa zayîna zarokan de, di rewşên derasayî de, li stasyonên palyatîf de, di lênihêrîna nexweşên demdirêj de, nexweşên giran de an jî yên ber mirinê de, an jî di rewşa lêniherîna kesên hewcedar de ev îstîsna derbasdar in.

3. Navendên lênêrîna rojane

Rêbaza gişti

Navendên lênêrîna rojane dikarin bên vekirin. Lê divê alîkariya çalakiyê ya Saziya Tenduristiyê ya berpirsiyar bigrin ber çav.

4. Kargehên ji bo kesên bi asteng

Rêbaza gişti

Kargeh dikarin ji bo lênêrîna asayî vebikin. **Lê belê**;

- ✓ Konsepta ewlehiyê û plana hîjyenê bi cîh bînin.
- ✓ Lîsteya agahiyên têkîldariyê yên mêvanan (yên kesên xerîb)
- ✓ Divê mirovê lê tê nêrîn lênêrîna bi vî rengî bipejirîne
- ✓ Kargeh divê li derên vekirî ji bo kesên lê tê nihêrîn, qedexeya têkiliyê/kontaktê biparêze.
- ✓ Ger miroveke/î bi asteng li gorî rêbazên hatine daxuyankirin nikaribe tevbigere, ji bo wî/wê li kargehê lênihêrîn çênabe

5. Navendên lênihêrînê û komên piştgiriyê ji bo kesên astengdar

Rêbaza gişti

Ev navend û sazî jî dikarin ji bo lênêrîna asayî vebibin. **Lê belê**;

- ✓ Konsepta ewlehiyê û konsepta hîjyenê
- ✓ Lîsteya agahiyê yên mêvanan (kesên xerîb)
- ✓ Ger hewce hebe meziniya komê kêm bikin.
- ✓ Divê mirovê lê tê nêrîn lênêrîna bi vî rengî
- ✓ Kargeh divê li derên vekirî ji bo kesên lê tê nihêrîn, qedexeya têkiliyê/kontaktê biparêze.

6. Avahiyên ji bo penaberan, karkerên demsalî, kesên bêxanî û bêmal:

Rêbaza gişti

Divê navberdanîna 1,5 m. bê parastin. Ger ev ne gengaz be, divê mirovên ku tên bicîh kirin, bên kêmkirin.

Beşa 3.

Baxçê Zarokan, Dibistan, Alîkariya zû und Dezgehên din ên perwerdehiyê (§ 16 heta § 18)

1. Baxçeyên zarokan (navendên lênêrîna rojane, lênêrîna mala zarokan)

Rêbaza gişti

Ev navend dîsa dikarin deriyên xwe vebikin. **Lê belê**;

- ✓ Konsepta ewlehiyê û konsepta hîjyenê
- ✓ Lîsteya navên zarokên tên lêniherîn her roj aktualîze bikin.
- ✓ Zarokên taybetî pêdiviyan wan bi ewlehiyê hene û di rewşên awarte de ne, pêşî tên girtin.
- ✓ Serîlêdanên –wek mînak li muzeyan an jî cihên lîstikê- bi destûr in, lê bi navberdanîn û konsepta hîjyenê.
- ✓ Heta ji dest tê; komên ji hev veqetandî û li menzelên cuda.
- ✓ Pêşniyarên ji hêla derên sêyem li baxçeyên zarokan derbasdar in; lê divê li menzelên cuda bên çêkirin.

2. Dibistan

Rêbaza gişti

Herweha dibistan dikarin vebibin. **Lê belê**;

- ✓ Konsepta ewlehiyê û konsepta hîjyenê: Wane di nav komên piçûk û neguherbar de tên lidarxistin.
- ✓ Komên polan divê di demên cuda de li korîdoran bin.
- ✓ Ger konsepta hîjyenê vê yekê hewcedar bibîne, dibistan dikarin waneya rûbirû kêm bikin. Bi vî awayî divê heta ji dest tê, heta pola 6'an lênêrîn ji bo zarokan bên pêşkêş kirin.
- ✓ Pêşniyarên ji hêla derên sêyem li dibistanan derbasdar in; lê divê li menzelên cuda bên çêkirin.
- ✓ Serîlêdanên –wek mînak li muze û cihên lîstikê- bi destûr in, lê divê li komên piçûk û neguherbar de bên rêxistin kirin.

Beşa 4.
Karantînaya Malê
(§ 19 heta § 22)

1. Kî divê bikeve karantînayê?

Rêbaza gişti

Ev kes divê di nav karantînayê de bimînin:

- ✓ **Kesên bi koronayê ketine**
  - Destpêk: Tavilê piştî testa pozîtîf
  - Dawî: Herî kêm 14 rojan piştî testê **û** 48 saet bê semptom **û** bi destûra bijîşk
- ✓ **Kesên têkîldar ên bi kategoriya 1.**
  - Destpêk: Tavilê piştî testa erênî yê kesê pêgirtî
  - Dawî: Herî kêm 14 rojan piştî têkiliya paşîn a bi mirovê pêgirtî re
- ✓ **Kesên ji deverên bi rîsk tên:**
  - Destpêk: Tavilê piştî vegerê
  - Dawî: 14 rojan piştî vegerê

Îstîsna

Ligel koronayê hûn dikarin ji mala xwe derbikevin; ger:

- ✓ Di xetereya jiyanî û tenduristî de
- ✓ Îstisnayên din li gorî rewşên awarte gengaz in. (Serîlêdan li Saziya Rêkûpêkiyê (Ordnungsamtê) û Şaredariya Bremerhavenê

2. Rêwî (Kesên tên Bremenê)

Rêbaza giştî

Rêwiyên/Kesên tên bajarê Bremenê divê di xalên jêr de baldar bin:

- ✓ Ger kesên rêwî 14 rojên dawî li heremeke bi rîsk mabin, divê bikevin karantînayê. Heremên bi rîsk li ser malpera Enstîtuya Robert Koch dikarin bên dîtin.
- ✓ Kesên ji deverên bi risk vegeriyane divê tavilê li Bremenê Saziya Rêkûpêkiyê û li Bemerhavenê Navenda Tenduristiyê agahdar bikin.
- ✓ Ger semptomê koronayê bi rêwî re derkevin, divê tavilê serî li bijişkê bide.

Îstîsna

Di van rewşan de rêwî ne mecbûr in bikevin karantînayê û saziyan di derbarê rêwitiya xwe de agahdar bikin. (Ger semptomên koronayê bi wan re tunebe):

- ✓ Kesên tim li ser rêwitiyê ne uf der Durchreise
- ✓ Dema bijişkekê/î piştrast bike, ku kesê rêwî bi koronayê neketiye. Ev piştraskirin bi têşeya nivîskî an jî dîjîtal hatibe nivîsandin û herweha divê herî zêde 48 saet berî rêwitiyê hatibe amadekirin. Herweha divê bi zimanê îngîlîzî an jî almanî hatibe nivîsandin.

3. Berpirsiyariyên dema karantînayê

Rêbaza giştî

Kesên di karantînayê de ne, divê di xalên jêr de baldar bin:

- ✓ Bêyî destûrdayîna rayedarên tenduristiyê ji malê an jî ji avahiya xwe dernekevin.
- ✓ Serdan/Mêvan nepejirînin.
- ✓ Di navbera xwe û kesên din ên malê de navber dêynin.
- ✓ Têkiliya bi derve re heta ji dest tê kêm bikin.
- ✓ Rêgezên paqijiyê bînin cih: Bi baldarî bikuxin, bipişkînin, bi rêkûpêk û paqij destê xwe bişon, destê xwe bi ruyê xwe ve nedin.
- ✓ Heke gengaz be, sibehê û êvarê her tim agirê xwe bipîvin.

- ✓ Heke gengaz be, di derbarê semptoman de rojnivîsekê bigirin. Agirê xwe, çalakiyên xwe, kesên bi we re têkiliyê de ne, tê de binivisînin - heta rojên derbasbuyî jî bigirin ber çav.
- ✓ Ji bo kontrolên pêwîst ên wekî rontgen, xwîngirtin an jî testên ji çerm tên girtin, amade bin.
- ✓ Wekî din dibe ku Saziya Tenduristiyê gazî kesên pêketî bikin, an jî di derheqê rewşa tenduristiya wan de li malê li wan bipirsin.

Beşa 5.
Danasînên dawî
(§ 23 heta § 25)

- ✓ Li dijî van rêbazan derketin heta cezaya 25.000 € gengaz dibîne.
- ✓ Ev rêzikname van mafên bingehîn sînordar dike: azadiya kesan, azadiya kombûnê, azadîya tevgerê û destnedana malê.
- ✓ Ev rêzikname ji 11. Tebax 2020’an heta 11. Îlon 2020’an derbasdar e.

Pêvek
Îstîsnayên derbarê karantînaya malê
(§ 23 heta § 25)

Kardêrên beşên kar ên li jêr dikarin xebatkarên xwe ji karantînaya navmalîn azad bikin. Di rewşeke wiha de divê kardêr lîsteya kesên ji karantînaya malê derketine bidin daîreya polêsan a heremî û navendên tenduristiyê.

1. Beşa Tenduristiyê:

Hemî karkerên beşa tenduristiyê, xebatkarên rêveberiyê û paqijiyê. Ji bo agahiyên berfirehtir li rêziknameya orjînal binêrin.

2. Karên ji bo raya gişt î:

1. Saziyên senatoriya eyaleta Bremenê
2. Parlamentoya Bremenê (xebatkar û parlamenter)
3. Meclîsa Bremerhavenê (endam)
4. Encumeniya Bremerhavenê (xebatkar û endam)
5. Saziya Tenduristiyê ya Bremenê
6. Saziya Rêkupêkiyê ya Bremenê
7. Saziya Nifûsê ya Bremenê
8. Saziya Koçberiyê ya Bremenê
9. Saziya Hemwalitiyê ya Bremenê (û dabeşên wê)
10. Polîsa Bremen û Bremerhavenê
11. Agirkujê Bremen û Bremerhavenê
12. Rayedar û saziyên din ên bi peywirên ewlehiyê yên bajarê Bremenê û herweha şaredariyên Bremen û Bremerhavenê, bi taybetî parastina ji karasetê
13. Dozgeriya gişt î ya Bremenê
14. Parêzeriya gişt î ya Bremenê
15. Dadgehên Bremenê
16. Girtîgeha Bremenê
17. Saziya bendera avê ya Bremenê (= di fonksiyona saziya rêkûpêkiyê li herema benderê)
18. Karûbarê çavdêriya xurekê, yê parastina heywanan û karûbarê veterîneriyê ya bajarê Bremenê
19. Saziya lêkolînê ya ji bo kîmya, hîjyen û veterîneriyê
20. Saziya Pîvan û Sererastkirinê ya bajarê Bremenê
21. Çavdêriya Bazirganiyê ya Bajarê Bremenê
22. Navenda Lêgerîna Kar, Ajansa ji bo Kar
23. Saziya ji bo Kolan û Trafîkê
24. Saziya Karûbarê Civakî
25. Saziya Temînkirin û Entegrasyonê ya Bremenê
26. Xezîneya Dewletê
27. Sîgortayên civakî, veguhastinên civakî, Saziya Karûbarên Xwendekaran
28. Saziyên serbixwe yên ji bo zarok û ciwanan, yên ji bo penabar û bêmalan, yên ji bo kal û astengan, herweha yên ji bo alikariya tiryak.
29. Karmendên ku li dibistan û malên zarokan lênihêrinîn awarte bi ser dixin.
30. Xebatkarên li dibistanan
31. Saziyên lênêrînê yên xwecîhî (wek mînak alîkariyên ji bo perwerdê)
32. Karkerê ji bo parastina agahdarî û mafê bidestxistina agahdariyê
33. Performa Nord
34. Saziyên eyalet û komunên din,
35. Saziyên ku xebatên wan ji bo domandina têkiliyên dîplomatîk û seferxanê û herweha xebitandina organên Yekîtiya Ewropî û saziyên navneteweyî hewce ne.

3. Binesaziya krîtîk:

1. Temîn û rakirin (Cêryan, av, enerjî, gelaş): wek mînak Hansewasser, Paqijiya bajêr a Bremenê, SWB/Wesernetz
2. Transport û seyrûsefer
3. Yekineya peravê ya Bremenê ya li aliyê rastê Bremenê
4. Yekineya peravê ya Bremenê ya li aliyê çepê Bremenê
5. Xwedîkirin: Pîşesaziya xwarinê, bazirganiya xwarinê, daristan û çandiniyê (§ 4 BSI-KritisV), radestkirin.
6. Teknîka agahiyê û telekomunikasyon (§ 5 BSI-KritisV)
7. Sektora aborî û sîgortayê: Banke, Pargîdan, Sîgorta, alîgirên kar û barên aboriyê (§ 7 BSI-KritisV)
8. Medya û Çand: Radyo, televîzyon, çapemenîya elektronîk û çapkirî, mal û milkên çandî, avahiyên sembolîk
9. Bremenports GmbH & Co. KG
10. Yekîneyên rêberên keştiyê / servîsa veguhestina rêberên keştiyê li benderê û li Weserê
11. Xîzmetên teknîkî yê EUROGATE li herema bendera Ubersee.
12. Saziya civaka masîvanên benderê
13. DFS parastina firînê GmbH
14. BIS Civaka Bremerhavenê ya ji bo pêşxistina vêberhênanê û bajarî, WFB, Fûara Bremenê
15. Balafirgeha Bremenê GmbH
16. Îstasyonên benzînê
17. Binaxker
18. Milkfiroşên Bremen û Seestadt û yên Bremerhavenê
19. Saziyên lênêrînê yên xwecîhî (wek mînak alîkariyên ji bo perwerdê)
20. Parêzerî
21. Komeleyên lênihêrînê û lênihêr/guhliser fermî/hiqûqî
22. Kar û xizmetên ewlehiyê